

HEJMAR  
20

# pîn

%100  
KURDÎ

SATOR ket OHALê... Aqûbet li serê me be!

KOVARA QERFÎ û WÊJEYÎ



kovara qerfî û wêjeyî ya nîv mehî


16-31 ağustos (gelawêj) 2000

Sayı: 20

500.000 TL

WE JI KU DERXIST  
KU EM XEBATKARÊN  
KURD NAXWAZIN YAW!..  
EZ FINDIQÊN HEMWELETİYAN  
DADIWEŞİNIM  
LÎ VIR!..

\* QEDEXEKIRINA LI SER KARKERÊN FINDEQAN ÊN KURD KU  
BERIYA SÊ SALAN BI TAYINKIRINA KEMAL YAZICIOGLU  
YA WALITIYA BAJARÊ ORDÜYÊ DEST PÊ KIRIBÛ, DIDOME.



BENAV + GİGİK

## Rehetîname û Rehetîfiros-II-

16) Latan biajon, galegalê bikin û heta beqan jî bixesînin. Çavê min, ji teorîfiros û perspektîfirosan cem û cem birevin, avê li ser xwe zelal bikin. (Heval sen sureci kramamışsin... Wey (Li min!...)

17) Li kasetta Diyar Kekili Presley zêde guhdarî nekin. (Alo Acil Servis!... Dinya beredayî ye! Oxlîm satarim nîrde lan!...)

18) Ger hûn dixwazin xwe bikujin, li TRT 4'ê, Açıkoğretimê temâse bikin!... (Kurê min biv!...)

19) Ji kerema xwe re, dema ne ji mecbûrî be, neçin 'Dewlet daîresî' û nekevin rîzê. (Ne diyon lan! Git yarın gel dediklî Kodummu, oturtturum).

20) Hûn bi Xwedê dikin, ji sıfîrên otobusen İETT'ye adresê yan jî tiştekî din nepirsin: Sîgortaya we heye? (Ne diyon lan! În aşağı çabuk).

21) Li otobusen ku diçin welêt zêde siwar nebin û ji muawînê otobusê avê nexwazin. (Oxlîm burasi babayin mali mi? Git suyunu kendin getir!)

22) Li marşan zêde guhdarî nekin! (Bimre astî, bijî şer!... Kî ji piştä bavê xwe ye, bila were meydanê, ka kî berx e, kî beran el!...)

23) Ber neavêjin, ez qala Cahit Merwan nakîm!...

24) Li nûçeyên Medya TV'ye temâse nekin, wê 'Sebra we bifûre!'

25) Pirtûkên Îmraliyê bixwînin. (Çavê min, we koka pirtûkan derxist!... Hûn distînin, lê bixwînin jî. Wekî din ji bilî wan, gelek pirtûkên din jî hene. Li gorî agahiyê dawîn, weşanxaneyan sîxur û ajan xistine nava Asrin Hukukê, da ku berî hemû weşanxaneyan hîm pirtûkên Îmraliyê bibin).

26) Biçin taflîl, lê tenê neçin 'Akdeniz û Egeyê'. Silêmanî, Mehabad, Qamişlo, Zaxo, Amediyê jî heye! (Ne xema we ye! Lewma di mîjîyen we de welat parçeyek el!) Jixwe başûrî û rojhilatî, bi xêra 'Bo raştîn' Ewropa' bakur dibînin, wekî din ne mimkun el!...

27) Kuro me dermanê rastîn ji bîr dikir!... Li bernameya 'Dengê Çêran', na, 'Dengê Gel' temâse bikin, wê bêhna we vebel!... Ji bo bêhtengiyê zêrê zêran el!... (Bîb...bîb...bîb...bîb...!)

28) Lê dil û gurçikên min, qet ji bernameya 'Çend Dîmen ji Kurdistanê' nemînin! Ne ji we be, wê mala Medya TV'ye bişewite, lewma ew 'Welatekî Nîgaşî' ye.

29) Ji telefona mesejan, na telefona destan oqyanûs bi oqyanûs birevin!... (Kontûr mîratno! Hinékî jî bi zarokên xwe sa bibin! Jixwe hevala/ê we dike bêje 'bi sê telaqê bêkontur' û dev ji we berde!...)

Ji bo ku hûn ji vê nexweşîyê xelas bibin, dest bi esrarê bikin, wekî din hûn jê xelas nabîn!)

30) Ji ûnetînet û chatan dûr bikevin (Tu dibê qey hûn ketine silûkê, hûn ji ser chatan ranabin!.. Ji ber evînên elektro-platonîk mala we xera bûye!... Jiyana we herimiye, bûye taristan!... Yanî we pê girtiye. Ji emrê we re çar tirê keran maye! Ha silavêne me li wan zerîyan bikin û bi şev televîzyona xwe zû bigirin!..)

31) Yanî xwarina zebeş, vexwarina dew bêkêr e, ji bo rehetiyê!...

Hûn biçin bin siya dara gûzê jî beredayî ye. Van tiştan pêk bînin, wê sebra we pê were!... Hûn li dereke din nikarin peyda bikin!...

Li cem Loqman Hekîm an Doktor Nazîf jî peyda nabîn!...)

32) Dawiya dawîn, rastiya rastîn, 'zarok' bin û xwe giran, kamil û ciðî nekin! Rahêjin çeqel, derkevin nav rez û bostanan!... Li kolanê bestenî bixwin û hemû grewatan bişewîtin!... Bi-heftokan û kabokê bilîzin!...

Li 'Bûka Baranê' temâse bikin û ji xêzelîman nemînin!... Zebeş û petêx bê çetel bixwin û bi-hûcikê xwe cilîm û lîqê xwe paqîj bikin. Baş e, em zêde dirêj nekin, emê li ser vê mijarê nivíseke taybet binivîsin!... 'Dema ku zaroka di dilê te de mir, tu yê jî bimîr!...'.

## Rizo-Dizo



## Dozo




## GUREZILAM

Revhat Arslan



# SEA SOR

KEMAL BÜRKAY LI HEMBERÎ PKK'Ê BÛ BERDEVKÊ KOMPLOYA NAVNETEWEYÎ



ECEWÎT LI SER REDKIRINA KHK'Ê SEROKOMAR SEZER TEHDÎT KIR



"OZGUR RADYO" JI ALIYÊ RTUK'Ê VE DÎSA HATE GIRTIN




TEŞHİRKIRINA ŞKENCEYÊ JI SÜC E.. RÊVEBERIYA GIRTİGE HA BERGAMAYE LI HEMBERÎ GIRTİYÊN KU WÊNEYÊN ŞKENCEYÊ ŞANDIBÛN DERVE DOZ VEKİR



Ku li vî welatî ûnfaza bêyî dadkirin hebe, wê wisa be.

Serokomarê kevn ê ku biraziyê wî hate kérkirin

## TİPA F



LI AGİRÎ, NAVÇEYA TAŞLIÇAYÊ, MEZELÊN GERİLAYAN JI BO KU WERNEGERIN ZİYARETÊ, JI ALIYÊ DEWLETÊ VE HATE XERAKIRIN.



SERSARIYA DEWLETÊ LI HEMBERÎ ERDHEJZADEYAN DIDOME




## LI SER CEZAYÊ KUŞTINÊ

LI WARGEHA DEMOKRASİ Ü AZADIYÊ AMERİKAYÊ XORTEKÎ JI AQILÊ XWE KÊM HATE IDAMKIRIN



medenî  
ferho



## CIVATA LI BER DÎWÊR

Her roj, eger Xwedê li rûyê Evropiyan binihêre, destêne xwe bide ber derza ezmanê sîn û şiloke, baran ji erd û ezmên nebare, roj piçekî çavêne xwe veke, ger-mahiyê bide erdê, civata me li ber dîwaran e. Jixwe kurd di dîrokê de her dem li ber dîwaran mane, lê mijara me ne ew e.

Roj piştî Serokomarê Dînan, Zade-Batgî bêyî vexwendin hate serdana Medya Tv, em çend roj-namevan û serokê rojnamevanen xwedî sertifîqeya sêwaxê birêz Cahîd Merwan li ber dîwarê pêgiha weleybolê li hev gihabûne hev. Her kesî tiştek digot û ji xwe re, bêyî guhdariya hevalên xwe ditewirand.

Her çiqasî rojnamevanen xwedî tir û qopana Batmanî û Diyarbekirî ku di dembûwereka ber dîwar de amade bûn, niha li vir in, lê melaiketên wan hazir û nazir in, ez neweyiyan nakim, bi bêbextî tiştekî li ser wan nabêjim. Xwedî wekîxerc û abûqatê wan be, weke heyî ezê bêjim. Eger hinékî belandin di nava gotinê min de hebe bila li min bîborin û herin û heyerin.

Îcar ez, kekê Mehmûd, lawikê Amedî Ezîzoglu, torinê Emê Gozê Mazhar, Maşo Mişmişzade ku hîna bêhna barûda Bêrûdê dikişine firmîkên xwe, moderatorê bernameya xweşmîrê Xoşavê, Zoom Necatî, torinê Miho Keleş Lokman û modaratorê Telegulê Çekdar ku berî çendekê sîngâ wî ji wexma çemê hemberî avahiya televîzyonê hatibû seyandin û ji ber dergehê bihiştî vegeriya û hwd.

Axir, birêz Cahîd Merwan ku biqaşî Şivan Perwer nebe ji, cihan tev heyrana wî ye, ew ji heyranê xwe ye, -Faysal Çiyayî û Beran Bedran ne di nav de-, weke her carê, gotin ji kesî re nedîhişt û evîna xwe ya rojnameyeke magazîn û xwerû kurdi dilorand. Cahîd digot: 'Di manşetê de, mirov bêje: "Genê Maradona û Pele dane xuyakirin ku kurd in." Rojname wê 40 hezar bifiroşe' û pê li spot û manşetan ket. Wê hingê Serokê Komara Dînan Zade Batgî, nîvcoyî milek ji yê xwe daxistibû, hate nav civatê.

Cahîd Merwan, berê xwe da Zade Batgî û got: "Mesela, di manşetê de "Kurdan bi teatroyê komarek saz kir." Wê hingê, 50 hezar wê li yek xurê bê firotin."

Wisa xuya dike ku serpêhatiya Ezîzoglu ku berî niha bi 17 salan caşikên Bucakan ew şêlandibûn, hate bîra Kekê Mehmûd, bi ken: "Di manşetê de mirov bêje: "Caşikan rewşenbirê kurd şelandin". Cahîd herdu lepen xwe li hev xistin û bi kenê hesenî: "Wê hingê hejmara firotina rojnameyê hema derkeve 100 hezarî."

Zade Batgî, di ber xwe de: "Biçirê, caw cawê te ye."

Xwedê kir ku Zoom Necatî hat û xwe bi ser her tiştî de dakir. Nexwe, Cahîd gotinên Zade Batgî fêm bikira, belçikiyan tev wê nikarîbûna wî ji nav lepen wî xelas bikiran. Zoom Necatî, hat û hat li ber min rawestiya û got: "Em biçin li trimbêla min binêrin. Xaza wê baş naxebite."

Fîşîna boxeyekî Espanyolî bi Cahît Merwan ket û herdu destêne xwe ber bi ezmên ve hilda, bêyî biaxive û hêrsa xwe bi gotinên li hev badayî bîne zîmên, ber bi dergehê hêwana xwarinê lûlikand. Li devê dergehê rawestiya, berê xwe da me û bi dengekî bilind: "Pêwîst e genê kurdan tev werin guhertin, da ademî û demokrat bibin."

Kekê Mehmûd: "Jixwe ku ev gotin bibe manşet..."

Ezîzoglu gotin ji devê wî girt û got: "Wê hingê rojnameyek nayê firotin."

# ZING

Cref  
NUMCU



GELİ TEMASEVANƏN HEJÄ. ME JI WE RE NÜGEYƏN DAWİ PESİKES KIR.. HETÄ NÜGEYE SİBEHƏ LI BENDA ME BIN.

CNN.. GUNDƏ REŞO EVDIRAHİM EVARBAŞ!



KEKO JI LOQENTEA  
WE RE HOSTE LAZIM E  
...



## Jİ DIVA MIN ÇEND NİFİR

-MIN JI HEWARA XWEDÊ, TU LI PÊ BÎ, GOŞTÊ TE LI ERDÊ BÎ..

-LAW EZ JI XWEDAYÊ JORİN HÊVİ DIKIM KU TU DERKEVÎ DERVE QEMYON LI TE BIQELİBE, TERMË TE BİNİN BER DERİ Ü PERÇEYÊ TE YÊ MEZIN JÎ GUHÊ TE BİMÎNE!..

-EŞO LAWO, TU XERÊ JI CIWANIYA XWE NEBİNİ..



Osman  
ÖZÇELİK**GURÎ**

"Birayê" me, dest danîne ser her tiştên me. Çi xisletên me yên qenc hebin dikin ên xwe. Dansêن me, muzîka me, çanda me. Nikarin kurtêlek nan bidin, dibêjin em mîvanperwer in. Ji siya xwe ditirsin, dibêjin em mîrxas in. Dansêن wan bêruh, çayçir du kevçiyêñ darîn ye. Radibin dibêjin kurd bê ziman û bê bingeh in. Ango "Gurîka navê min li te, kumê min li serê te". Di pêkenînen xwe de, di nivîsarên edebî de, di karîkatûran de kurdan bêhiş, hesûd, zikreş, lal, bêkêr nîşan didin.

Vêya ew qasî li ser hev dubare dikin ku, êdî kurd bi xwe jî bawer dikin. Bi kurdan dane qebûlkirin ku, kurd wê tu carî nebe mirov. Êdî kurd li ser nemiroviya xwe 'darb-i mesel'an diafirînin.

Di şevbuhêrkan de kurd, wekî kes û kesyetî pesnê xwe didin. Belê mîna gel û netew xwe biçûk dikin. Ruhiyeta neteweyî hatiye şikenandin. Li ser çavnebaryê çîrokeke wiha tê gotin.

Kurdê xizan rabûye ji Xwedê re due kiriye. Gotiye "Xwedê!" Xwedê gotiye "Bêje. Belê qenc bifikire, ez ci bidime te, du qatê wê jî, ji cîranê te re." Mêrik cûye malê, bi vir de daye nebûye, bi wê de daye nebûye. Xew lê herimiye. Malekê bixwaze, wê yê cîran du mal bin; kîsek zêr bixwaze, wê yê cîran du kîs bin. Destê sibê, bi şeveqê re, bêxew cûye ba Xwedê. Gotiye, "Xwedê", Xwedê gotiye "Lebê". Gotiye "min biryar da". Xwedê gotiye "Tu qenc fikirî?" Gotiye "belê". Xwedê gotiye, "bixwaze". Mêrik gotiye "Xwedê ez dixwazim ku tu çavê min ê rastê birijînî..."

Di çîrokê de tîpa kurd, ji bo herdu çavêñ cîranê wî birije, çavekî xwe feda dike. Em werin ser rastiya jiyanê. "Birayê me", bendavan li ser çemên Kızılırmak, Sakarya û Menderesê ava nakin. Hebe tunebe Ferat û Dîjle.

Bendav, hêjayiyêñ dîrokî yên şaristaniya kurdan binav dike, me ji dîroka me diqetîne. Bi wendakirina dîrokî çavekî xwe dirijînin. Belê yên kurdan du çav. Di rastiyê de ew, di çîrokan de em çavnebar in.

Gurî navê xwe li me kiriye.

**KEREM KE!**

ERTÜĞ SONMEZ



LOZIN



Haydar IŞIK

ÇİMÉ FERMANDARANÊ ALMANAN

Çimî estê zengê (şîn), çimî estê keskê, çimî estê şayî (siya) û çimî estê vînenê û heveyê (tayê) ji estê korê. Îyê ke nêvînenê, yanê seqetê ïnan rê qiseya min çîna. Qusîrê ïnan niyo. Rengê dinya, tîj û sond besenêkenê ke bivînê. Feqîrê ïnsanê niyanenî (winayînî). La belê ïnsan ke çiman ra seqet bi, ya rind eşneno, yan ji hîsê ey zaf quwetin beno.



Ez bawera çimî siyasetkar û ferman-daranê Almanan o rast, kor o. Eve nê çiman nêvînenê. Nika mi vat, eke çimî yewî ke seqet bi, goş eşneno, hîsê ey beno quwetin. La belê Almanya de wina niyo. Çimo rast seqet o, hîsê ïnan ji sifir û goş ji ker o. Eve yew çim, çimê çep a niyadanê (ewnenê) û tenya fîkrê çep, merdimê çep û komê kurd vînenê. Coka mîleta kurdan dişmen vînenê.

Fâşistê Almanan mîlet qîr kenê, keyanê tîrkan û kurdan veşnenê danê karkeranê ecnebûra, komê Afrika rê kes qise nêvano. Dostê ïnan polîsê, dostê ïnan siyasetkar û dewlemendê. Eke ïnsan pers bikero û vajo, mîleta Alman 6 mîlyon Yahûdî qîr kerdi, xebera şima bî, yan ji nêbi? Tayê kes nêvano ke, ya xebera ma biye. Ya vanê qebahat Yahûdiyan de bi, yan ji vanê na qîsa rast niya. Yanê qetîlam xorê kenê kilif, zey cîrananê mayê Tîrkiye. Îyê ke vanê qebahat Ermenyan de bi, yan ji mîleta kurdan de bî. Yanê çimê tayê tîrkan ji korê.

Elî Gazî, lajê Gazî Muhamedî yo û mardimêdo rindo. Dostê mîleta xoyo. Zey tayê serokanê partîyanê kurdan, "Kurdê rind" niyo. Hetê mîleta xo de ro, qisanê birêz Serok Apo rind gosdar-neno. Roşnîkarî ya birêz Gazî esta, nete-wa mîleta xo wazeno. Kurdê niyanenî ra "kurdê xirab" vanê. Nika yew o niyanenî beno dişmenê siyasetkaranê Almanan. Çimo ke vîneno birêz Gazî niyadeno. Telefonê ey, postê ey, keyeyê ey genê bin kontrol. Endî Elî Gazî ke se keno, şîno kotî, kamiya qisey keno, şond û şodir weşîya ey teqîp kenê. Zerya (dilê) ey çiqas erzeno, nabzê ey çiqas erzeno almanî eve rastiye zanê.

A roje polîsê taybetî kewtî keyeyê ey, kever şikit, pencey şikit, zaf zîrâ da Elî Gazî. Şîma zonenê çîra keyeyê (çeyeyê) ey saye kenê? Vanê topê havan keyeyê ey de estê. Peynî de ci dî. Koy mere ard dîna. Polîsê alman çiyê nêdî. La belê mesele zîrâ dayino. Verê çehar seran keverê (çever) min ji şikit 12 hezar mark zîrâ da min. Ez se vajî, hem çimkor û hem ji hîs çîno, ïnsanetey ra tam biyê dûrî.

# XêZer Bêredayî



# ELETEWS

Sefer SELVI



MEMED DREWS

Burkay peynî de bi wayirê pisîng

E-mail: drewsmemed@hotmail.com

Çimê şima roşnî, keyeyê şema şen bo. Burkay peynî de bi wayirê pisîng. Êêê badê hendayê seran wayirê pisîng biyayin hend rehet nêbi. Burkay qandê wayirê pisîng biyayin xeylê zahmet werd. Xeylê ariq rişna. Partî jî ronê. Ancax, ancî jî nêşabi bibo wayirê pisîng. Peynî de serdaranê dewleta Almanya, raya wayirê pisîng biyayin mûsnê Burkay.

Goreyê vatenan serdaranê Almanya; Burkay ra wina vato: "Birêz Burkay to hetanî nika qandê wayirê pisîng biyayin, xeylê çî kerd. Xeylê çî kerdina jî nêmendê, to porê (gijikê) xo kerd sipî. Ancî nêbi. To partî ronê. Ronayina partî ser a 25 serî ravêrd, feqet partî jî nêşa to bikiro wayirê pisîng. Tabî mayê rind nêzanê, tiyê wazenê bibê wayirê pisînga senîn? Eke pisînga Wan niya, ma şenê wastena to biyare ca, feqet eke tiyê vanê îleh jî pisînga Wanî, lazim o ke ma verî cinawirê Wanî ra xeber bidê, feqet jew şertê mayê werdî esto. Tenya tiyê vajorînê (berdevk) kampanyaya ke ma vera PKK daya destpêkerdin bikirê".

Nê vatenanê serdaranê Almanya ser, Burkay jî wina vato: "Wa min rê pisîng bo bes o. Xora pisîngê Wanî, pisîngê weçînayeyê û wext o ke

## TABLÊTÊN E

KEKO DESTÊ  
MIN BERDIN.. EZE  
BIGIM INTERNET  
KAFAYE JI XWE RE  
CHAT BIKIM.. JI RUYE  
WE KEGIK JI DESTÊ  
MIN DIREVIN...

KURO  
TERE D  
PÊÇ AV  
BIGIN H  
INTERN  
JI DES



yenê teverê Wan û hewayê Wanî ra  
vnê dûrî, derhel mirenê. Coka ferq nêkeno.  
a pisîng bo bes o. Şert o bîn lazim nêkeno  
ha vajê jî. Xora vajorîna kampanya wezîfeya  
a. Hetarî nika min hemû kapanyayan de ca  
ot û iftira PKK ser çekerdin jî wezîfeya min a  
xora maya min, ez coka arda dinya".

Teynî de Burkay teklîf serdaranê Almanya  
bûl keno. Bedelê hend zehmetan û  
qrişayin geno. Yaa hendayê zehmet û ariq  
bedel beno? Béguman nêbeno.

Goreye vatenan qandê wayirê pisîng biyayin,  
vribiyayinê Sekreterê NATO, Clinton,  
Röder, Blair, Simitis, Ecevit, (Demirelî jî  
saja serkewtin rîsta.) Celal Talabanî û Mesut  
zanî ya Burkay rê Almanya de merasimê  
îlî virazyayo. Burkay merasimê teslîmî de  
okê ke nameyê ci yê cord ravêrenê pêrin rê  
as kerd o û vato; o yo na rindîna serokan xo  
nêkerô û peyra jî silogana "Bijî jûwîna  
keftina qûwetanê vera PKK" çekerd a.

Goreye vatenan kêf kêfê Burkay o. O yo nika  
o kotî pisîng xoya piya beno û o yo hetanî  
nd rojan jî tewrê programê Televoley bibo û  
heqê wayirê pisîng biyayin û wezîfeya xoya  
ser temâsekaran xeberdar bikiro. Xora  
kay senî ke bi wayirê pisîng kamerayanê  
hisa Anadolu cayê kamerayanê Televoley  
ot û iyê peyê Burkay nêviradenê. Hinî  
kay o; se (çigî) vano TRT yo verê vatenanê  
daranê dewlet, ca dano vatenanê ey. Ajansa  
adoluya jî verê vatenanê serdaranê dewlet  
ta verê vatenanê Demirelî jî) vatenanê ey  
ena rojnaman û televîzyonan.

## EREDAYI

TU GAWA TOVÎ? EZ JI  
BÊJIM SEYTANOKÊN ÇINÊ  
ETINE QUNA QRALË ME. EM  
EVFÊ HILININ, TU DIBÊJÎ  
ET Û KEG. LAWOO! NAMUS  
QUNAMUS.. PIG KURE  
PIGA!..



# GEŞ O BAŞI

İMAM CİCI



**SÜ**



MURAD BATGI

TU DIBÊJÎ QEY PARIS E...

Dema em ciyekî xweşik dibînin, em dibêjin qey Parîs e... Lî niha ev revşa Parîsê guheriye. Ji ber destê kurdên me guheriye... Ma Kurd ewqas jîr û pehlewan in ku ne Parîs, ne jî bajarekî din dikare li ber xwe bide. Kurdên me naxwazin gundêñ xwe bikine weke Parîsê, lewre ew li Parîsê weke ku li gundê xwe dijîn, jiyana xwe didomîn. Û niha dibêjin; 'Tu dibêjî qey Parîs gundê me ye...'

Di çarçoweya tûmeya şanoyê de, ev çend heftê ye em li Ewropayê ne. Ji ber vê yekê jî riya me bi Parîs jî ket.

Hevalêñ me yên hêja û kurdên me yên welatparêz em li Parîs gerandin. De mala mîrata Parîs bişewite, ne serî heye, ne jî binî. (Wek xebat û gera hevalêñ me. Ne serî heye, ne jî binî) Welatparêzêñ me yên ku li Parîsê dijîn ji dewleta Fransayê ne razî ne. Lewre dewleta Fransayê derfetêñ cîvâkî nade van welatparêzêñ me. 'Naxwaze kurdên me yên ku li Parîsê dijîn, xwe bi pêş ve bibin.' Bêyi daxwaza hevalêñ me, dewleta Fransayê wan bi darê zorê fîrî zimanê Frensi û zimanê biyanî yên din dike. Yanî dewleta Fransayê bi darê zorê dixwaze zimanê 'tirkî' bi kurdên me bide jîbirkirin. (Çok ayip ediyor...)

Dewleta Fransayê bi darê zorê hevalêñ me li Eyfelê, Qesra Notherdamê, Shanzelîzeyê û gelek ciyêñ Parîsê digerîne. Ev ger ji bo kurdên me weke şkencyê yê. Ji ber ku dema welatparêzêñ me li van deran bigerin zanin ku wê 'asimîle' bibin. Gelo ji bo ku hevalêñ me û welatparêzêñ me asimîle nebin, ji dewleta Fransayê çi daxwaz dikin ku daxwazêñ wan tu carf bi cî nayê?

Cî ne daxwazêñ hevalêñ me? Hevalêñ me û welatparêzêñ me dibêjin,

Parîs gundê bav û kalan e.

Tê de hene bi hezaran kuçe û kolan û meydan e...

Ev kuçe û kolan û meydan ciyê berx û miyan e...

Li dewleta Fransayê bê dîn û îman e...

Her avahiyek ava kirine tu dibêjî qey asîman e...

Her qesrek ava kirine tu dibêjî qey deşt û zozan e...

Lî mixabin ji bo berx û mîhîn me cî nemane...

Em jî wisa bê dengê bilûrê û bê dengê berx û miyan, belengaz û perîsan mane...

Ey dewleta Fransayê!

Ji bo mî û berxen me cîñ divêê...

Ji bo razanê kon û çadîirîñ divêê...

Ji bo şustinê şûnîk û çem û kanîñ divêê...

Ji bo şivanêñ me bilûr û eba û nanê hişk ê nav ebayê. Hinek toraaq divêê...

Yanî qisadan hîsse...



Hadî gel koyûmûze gerî doneleşim... Fadîme qaçmîş halay çekelîm...

Tu devê kîjan kurdî vedikî, evîn û hesreta welêt di serê çend mî û berxan de û di nav parçeyek nanê toraqê de maye... Hey mala we here mîratê û êdî venegere... Em dê hemû berx û mî û çem û kanî û şivanêñ kurd bisînîñ Ewropayê, bila îltîca bikin. Jîxwe kurd nikarin werin welêt, qet nebe em hesretêñ kurdan bibine Ewropayê.

Tu kes dema behsa hesreta welêt dike, behsa şaristaniya Mezopotamyayê nake. Li gorî min jîxwe di rastiya xwe de tu kes meraq jî nake. Evîn û hesreta welêt tiştekî din e, naskirin û fîmkirina medeniyet û şaristaniya cîhanê tiştekî din e.


Yanî ku Parîs ji kurdên me re bimîne, wê berx û miyan xwe derxin Eyfelê, wê şûnîkên xwe bigirin û li Qesra Notherdamê cil û bergên xwe bison, wê li Shanzelîzeyê kon û çadiran vezin, wê mîrîtî û begitiya xwe li qesrî Parîsê bidomîn. Lî em gundê xwe ji parşîyan re bihêlin, Xwedê zane ku wê cî çê bikin û cî çê nekin...

Em nabêjin gundê xwe ji bîr bikin, lî zanibin ku ev şaristaniya heyî, ya hemû mirovahiyê ye. Yanî xwêdana we û xwarina we jî heye di nav vê şaristaniyê de. Hûn li hemû şaristaniyêñ cîhanê xwedî derkevin, wê demê wê şaristaniya Mezopotamyayê ji bo we bibe tiştekî biqîmet. Nexwe hûn û berx û miyan xwe heta hetayê li çavêñ hev binêrin û heta hetayê li benda hev bimîn...



K  
-  
I  
-  
S  
-  
E  
W  
X  
E  
N

Revhat  
Arslan



# QONANS





## Collage



◆ EHMED HUSEYNÎ

1 -Di vê serdema ku êdî roj bi roj pirs û guftûgoyên balkêş û mezin bi xwe re tîne û di pêşveçûna xwe ya pîşeyî û teknoloji de, saw û metirsiyên rasteqînî li pê xwe dihêle, em dibînin ku pirsa çanda neteweyî û awayê parastina zimanê dayikê û parastina kesayetiya dîrokî ya gelan hin ji pirsgirêkên rojane yên felsefeya rewşenbirêr vê serdemê ne.

2 -Yek ji wan alavên tirsnak (wek serencamek ji serencamên şoreşa nû ya mirovatiyê, ji boyî ragihandinê) ku bi giranî mijara vê guftûgoyê ye, televîzyon e.

3 -Çandêñ jîndar, zimanêñ zindî û kevnar in, şaristaniyêñ bejinbilind û rehdaçikyayî, gelêñ azad û serbixwe, digel sînor û al û leşker û dewlemendî û desthilatî û zanistêñ xwe, îro, li ber vê dîmena teze radiwestin û hewl didin ku çand û zimanê xwe ji pencêñ yekrengiya GERDÜNİZMÊ biparêzin.

4 -Em dê bi ku de birevin?

Ji milekî ve êrişâ dijwar a proje û bernamê û planêñ zuhakirina hest û giyanê me, asimîlasyon.

Ji milê din ve ji, gerdûnîzma ku dê me û dagirkêrên me bi heman agîrî bisewitîne.

5 -De hûn ji, ey kurdêñ vê serdemê! Televîzyonêñ xwe bikine alavine rasteqînî bo hişmendî û hişyariya vî gelê ku ber bi nemanê ve diçe. De bila mebest û armanca we pêşvebinâna zanîn û têgihîştina mirovan be. Bila hewldana we ji boyî dewlemendkirina hişê kurd, bîra kurd û hizra civaka kurd û kûrkirin û rehdaçikan-dina hoker û regez û sîma û bingehêñ kesayetiya neteweya kurd be. Asoyêñ xelkê bo têgihîştina huner û wêjeya kurdan berfireh bikin û çêja xelkê şayik bikin, zimanê wan ber bi dilê wan ve rakişînî! Çemkêñ (mefhûmîn) civatê bi serdemê re biguncînîn û nirx û buhayiyêñ mirovane belav bikin û biçînîn, ciwaniyê, spehîbûnê ragîhînî!

6 -Xelkê hînî ramanêñ berfireh bikin, da ku raperîn û zimanê xwe, tore û wêje û dîrok û êş û xewna xwe himbêz bikin. Bi şêweyêñ zanistî, kelepor û mîrata kur-dan veguhezînîn nifşen nû û di navbera me û pêşerojê de pirekê ava bikin da ku em bi ew e ber bi paşerojê ve biçin.

De hûn ji televîzyonêñ xwe û xwe(!) ji toza dîrokê daweşînîn û li zimanê xwe xwedî derkevin, pêş ve bibin, gencîneyan ronî bikin, şîyan û hêza ku di rehêñ zîmêñ de veşirtî mane, biteqînîn.

De hûn ji besdarî parastina çanda neteweyî ya gelê kurd bibin, netirsin! De hûn ji xwe ji kompleksên xwe rizgar bikin û ji hespê xelkê peya bibin û zaravayêñ kur-dan nêzî hev bikin û (EZ)a neteweyî ya pîrozmand, ku diçilmise, ji ber zixtêñ dagirkaran û ji ber neçarî û bêhûdeyiya vê gerdûnîzmaya ku ber bi me ve tê, birevînîn.

7 -De bila televîzyonêñ we ji nav di xwe bidin û simbêlêñ zersosinî yên serhişkiya çiyan ba bidin û di bernameyêñ xwe de li kesayetiya resen a kurdan bigerin. Bi awayê tirk û erek û eceman nekin, ji xwe dest pê bikin û li xwe bigerin.

8 -De 'bi xêra xwe' me û temaşevanêñ xwe, ji bernameyêñ 'bişûndemayînê' yên dengbêjêñ bernameyan ku bi lawazî û nezanî feisefeya vê serdemê dadimezirînîn, azad bikin.

9 -Têbiniyek:

Televîzyona ku nikaribe rewşa civakî, siyasî, giyanî û dîrokî û kêra li ser qirika gelê kurd bibîne, dê nikaribe gotarek (xîtabek) rewşenbirî ji biafirîne. Tunebûna gotara rewşenbirî, alava ragihandinê zû bi zû pîr dike. Baca pîrbûnê ji, wek ku serdema me ya nû dest nîşan dike, giyana neteweyî ye.

# Hamedank!

Zindî - Zinde - Cunde

Wexto ke kovara Pîne kewno destê mi; siftinî macerayenê Rizo Dizoy, Bado rîpela Heşo Baqîl, badojî, quncika (çenga) 'Lozin'e de meqaleyâ Haydar Îşik' wanena. Hemin râ jî keyfê de girdi cena.

Çengeyê Haydar Îşik zaf rengîn. Qelema xo rind tenik xebitneno û espriyanê hewlon rezanê xo de peser - peser keno xo de xo zaf perso; "Haydar Îşik nînon çîtûr û miş keno?" Çaye ke şekîl û sıfet ra Haydar hende espîrîdar nîaseno. Qabilîyeto de hewlo.

Humara (amora) Pîne ya 19'in de meqaleyâ Haydar Îşik: "Zindî" ser biye. Wexto ke mi meqale wend birêz Îşik zaf hêrsin veyna.

Mesele no yo:

Heştê ra raver MEDYA TV' de prorama 'Veroz' est bi. Guçê TV de "Zindî" nîvîsno. Yew mordemekî telefon kerd, "bira o zindî çîko? Zindî ebi, ziwanê ma niyo". Vat û gerêya. Qemero sebirdarî wäst ke mordomek re salux bido, feqet tabat bi merik bîrîyo."nê..." vano, zobino çiyê nîvano. Zîyar û dîyarê ma sebir biderê Qemeri. Karê ey goşdaran dest xeyle xeyle çetîno. Nika acherîme serî mevzu: "Zindî" Zazakî yo, yan jî niyo?

Ebi zanîtisê mi zindî zazakî niyo, kurmancîyo. Farîskî de vame "zinde" wexto ke însan vacero "ez hewt ser Stenbol de mamene /nîsena ro" O wext Farîstî vacino "heft sal est kî, men der İstanbul Zindeg mî-konem". Wexto ke slogan est vat, "herbijî" ebi Farîskî vacino, "zinde bad!"

Coşonê bîhon de nîzana, feqet Dersim de "zindî" re vone "cunde" Persa de axiretiye eşta, vanê, "merdey zafe, yo cundey?" Wexto ke ju min ra milqî kerd, vanê, "no.. merde û cundene to" Henen taxmîn kena ke "can" vuriyo, biyo "cun" can -cun, cande- cunde, candeg - cundeg zeb... Na çekuyê (vaje, nuxde) kewto ziwanê Tirkan ke; ê "can - canlı" vanê.

Verde ra, wexto ke programê zazakî est bi guçe TV de "Desînde" amene nîvîskerdîş. Feqet o wext palunjan û tayânê bîhan geriyyat û vat ke, "bira ïn (no) Desinde çîko?"

Goreyê fikirê mi çekuya "Desinde" pozisyonê neqîlkerdiso, teze teze ebi xo dest dayiso yanî, noqlen.. Arabîk vanê mobaşîr, îngîlizkî vane Live. Eke zazakî de bivaciyo "Desinde" mûnesib kewno. Nika jî wazeno ke hetê şekîl (ferm)ser meqoleyê ra tayê alîncan binîmî. Haydar Îşik nîvîsno;

"Wojime kîrmancî bas qeseykeno" "Baş nîvacîno, rind, delal, hewl ..., vacîno.


"Zonê Ulusê zazauno". "ulus" niyo, şar, netew "...û her duşunce gereke serbest bivo" Lazim o ke her fikir serbest bivo.

"Îste nîyanê zaf tehlîkeyî", tehlîkeyîn, ebi tehlîke:

Ziwanê netewî (şarf) lazimo feqet; terefî bin ra lazimo ke lehçey bê şekil mebe.

Murat Kit

AHMET NECTDET SEZER K.H.K QEBUL NEKIR



## ZAROKNO! MİRZE MIHEMED BI HAWARA WE VE HAT!

### DÊ Û BAVÊN ZANA!..

Çirok mamosteyê herî hêja û xwînşîrîn e!

Zarokên xwe bi çirokên kurdî razînîn!

Tatîl bi çirokan xwes û geş e!

ZAROKÊN NO Û NETEBAT!..

Guhê dê û bavêن xwe qul bikin, pirtûka we derket!  
Mîrza Mihemed zora Hîmen jî zora Pokemonan jî dibe!

WEŞANÊN WELAT

Ji belavkarêñ Azadiya Welat û Pîneyê bixwazin.

Tel: (0-212) 251 90 13, 251 79 37 – Fax: (0-212) 251 95 85

Welat derket



Li hem bayîyan e.

Kovara panzderoji (Onbesgûnlîk Dergî)

Xwedî (İmîyaz Sahibi) M. Nuri Karakoyun  
Lijneya Weşanê (Yayin Kurulu):  
Mazlûm Doğan, Doğan Güzel, İmam Cice

Berpirşyare Karê Nîvîsaran  
(Yazi İşleri Müdüriyeti) Abdurrahman Pekeris  
Navnisan (Yönetim Yeri) İstiklal Cad. Ayhan  
İşk sokak 19/1 Beyoğlu/ İstanbul

Tel: (212) 292 72 70  
Fax: (212) 251 95 85  
E-Mail: pinedank@hotmail.com

Kargerîf (Idare) (212) 251 79 37  
Çapxane: Aspaş Matbaacılık.  
Yayin Koordinasyon  
Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.

Belavkirin BİRYAY Dağıtım  
Nûnergel: Edene: (322) 351 42 78  
İzmir: (232) 446 19 50 Mersin: (024) 237 66 49

## B E Q Ên destê sibê hatine dinyê

Hefteya ku bê hûnê tevî kockteylekê bibin û rastî hevalen xwe yên kevn bê. Pistî serborî û bîranînan, dê mijar bê ser "pêva-joya dawîn". Hûnê li ser yekîtî û astiya kurdan pêşniyar û şiroveyan bikin. Lê belê bi dawiya şevê, bê biryar hûnê xatir jî hev bixwazin û heta kokteyleke din hûnê randevûyê bidin hev. (Oynamâ sîkidim, sîkidim...)

## QUŞXANE Ên berî nîvرو...

Pêşeroj di destê we de ye. (Li destê xwe nenihêrin hal...) Lê destê xwe nenihêrin hal...). Lî kompleksên beredayî dibin belaya serê we. Projeyen we, mîna Şaredariya Sertê, ketine ser hev, lê tu hewlidanen we tune ne. Hûn wekî dapîra min, tiştîn bas dibêjin û mîrovan dixin nav heyecanê, lê belê ji ber vê jî hûn kefenê xwe amade dikan.

## MOZ Ên pîstî dana pez

Hûnê dil berdine yekî. Evîna we, wekî eşqa. Mem û Zînê, dê li çamîkarê gundan deng vede. Dû re dê "Bekoyek" bikeve navbera we û hûnê ji hev veqetin. Hûnê ji bîqeherin û hestê-xwe birijînin ser dîwîr û kaxizan. Bêhemdî hûnê bibin helbest-vaneke navdar. Helbesten we dê di kovar û rojnameyan de biweişin. (Tu bûyî baqek helbest, ey keçika fîrdewî...)

## CAŞIK Ên ber êvarê...

Kuro/Keçê, guhê xwe baş bide me... Tu çîma dilê diya xwe dihîlî? Wê neh mehan te di zikê xwe de, tevî pihînen tu, xwedî nekir? Heta deh salan şîr neda te? Nexwar û venexwar heqê dibistana tu neda? Keziyên xwe nekir melkes û te pê nedâ xwendin? Lê dîsa jî tu nebûyî güyek. Niha tu hînî sê çar peyvîn gilover bûyî û jê re qala "Nihîzîmî" dîki.

## ZIRNE Ên nîvî şevê...

Hevala hêja, mebihîst ku, we dev ji rexneyan berdaye û "Komîsyona Zimanê Kurdî" ava kiriye û hûn êdî perwerdeya wê dikan. Ma pişti vê helwestê em êdî dîwîrin tiştîkî bibêjin? Bila ketin dîrokê, helwesta we ji pêşerojê re çîrûskek xebîra we jê hebe. Bêhemdî be jî hûn e... (Bîjî biryara we!!!)

## HUDHUDK Ên heft mehî hatine...

Ey hevalen ku hatine şelandin, ev remîl ji bo we ye!.. Mebihîst ku van rojan diz dikevin malen we û zér û baziñen we didizin. Hûn bi şev nobetê digirin, çer û nifiran dikan û niyeta we, hûn herin cem M. Selîm (Şaredarê Sertê) û jê re nivîştekê çekin. Serê xwe neêşînîn. Li dora xwe binihêrin, yê ku amadekariya "leşkeriya bi pereti" dike, stûyê wî bigirin.



Hejmar: 6 Piştî İsa 2000 > Xwedî û tiştîn din: Faysal Dagli (Li ser navê weşanxaneya T&T) > E-mail: nilamed@google.com

# Kundır

Rojnameya fülotonom

## KUNDİRYAL

**Kundirên hêja, heta mirov bi paqîjiya ber deriyê xwe ve eleqedar nebe, nikare şîretan li kesî bike.**  
**Kundirno, ji bîr nekin, çavê dîrokê li ser we ye!**  
**Em ji hemû kundirên kurdan hez dikan. Lî em wan gez jî dikan!**

GENA SIYASETMEDARAN  
DIYAR BÛ.

(Kundirpress/taybet) Pişti ku Projekt Genom diyar bû, endezayarên genetîkê encamên lêkolînên li ser laşê kurdan jî diyar kirin. Li gorî lêkolînên ku li ser xwîna siyasetmedarên kurd hatine kirin, diyar bûye ku di xwîna gelek siyasetmedarên kurd de vîrûsa birakuji, hesûdî, dexesî û gelek cûreyên nexweşiyê din hatine tesbîtkirin.

Li gorî bijîşkan, ev vîrûs ji nan, av û pereyên dewletên dagirker û Ewropayê, derbasî xwîna siyasetmedaran dibe û careke din jî zû bi zû dernameke.

Vîrûs demekê dibe ku di xewê de bimîne. Lî carekê ku têkeve laşê kesekî/ê, ew kes êdî hew dikare jî bifilitê.

Li gorî pisporan, tenê çareyek heye, ku ew jî ava kaniyên Cudî ye.

Siyasetmedarên ku di xwîna wan de vîrûsa birakuji, hesûdî, dexesî û xayıntiyê heye, divê çend salan biçin ser çiyayê Cûdî û ji kaniyên wir avê vexwin û ji giyayê vî çiyayî melheman çê bikin û deynin ser dil û çavê xwe. Pişti demekê wê mîkrobêni di laşen wan de derkevin û derûniya wan li wan vegere.

Pisporan wekî tedbîr jî pêşniyar kir ku divê gelê kurd li hember siyasetmedarên ku nan û ava mîletê xwe nexwaribin û venexwaribin hişyar be.

## ELO CİMŞİD (bernameya malbata we)

- Temaşîvanen eletewş û seyrbeleş, em dîsa di Elo Cimşîdekê de bi hev re...

- Elo Hevalê Cimşîd rojbaş.

- Rojbaş temaşevan beg.

- Hevalê Cimşîd niha ez dixwazim bêjîm dema ku ez destavê digrim...

- Hop hop ev der bernameya siyâsi ye, ci eleqeya me bi destava te heye?

Belê temaşevanen têlmasa, niha ji Amedê Ebûzitîn Zeytûnzade li ser xeta me ye.

- Hevalê Cimşîd hûn çawa ne? Ez pir heyecanlı me, min işev xewnek dît ku ez çûbûm ser hîvî, gelo ev ci iş e?

- Belê, wê hevalen me yê rejiyê xewna we şîrove bikin, niha jî ji Bazîdê Tombîş Çavşîş li ser xetê ye, belê Tombîşan...

- Sayin Cimşîd beg, gelo bi tirkî ez karim xwe ifade etmîş bikim?

- Sayin seyircîmiz ev bernameyeke xwerû bi kurdî ye, olmez. Em we bi Sêla Sor ve girê didin. Belê temaşevanen evdilezîz û lezîz me ev car jî qedand. Heta bernameyeke din Xwedê mezin e.

## NÜÇIK



## T I A N

- Ez li tiştîkî nagerim.

**Cahid Merwan,  
Bernameya Sêla Sor**

- Ez li babağidekî digerim ku kovara Pîneyê bigîhîjîne min.

**Faysal Dagli, Kundir**

- Em li şarîstaniyên kevn digerin ku li ser wan bernameyan çêbikin.

**Nilgün Yıldız, Bernameya  
Şarîstaniyên Mezopotamyayê.**

- Ez li kesekî digerim ku pê re têkevin polemîkê.

**Yaşar Kaya,  
Rojnameya Ozgur Politika**

- Ez nexweş im gewrê, were ser min...

**Mehmûd Baksî.**

- Em li benda Godot in...

**Kesên ehmeq**

- Ez li pereyan digerim ku meaşê karmandan bidim.

**Celal Telebanî,  
Hikûmeta Soran**

- Ez li karmandan digerim ku meaşbidim wan.

**Mesûd Berzanî,  
Hikûmeta Behdinan**

- Ez li karîkatorîstan digerim ku bi min yariyan bikin. Süleyman Demirel

- Serokê Şaredariya Amedê Feridûn Çelîk, di bin banê şaredariyê de qursen fêrbûna xwendin û nîvîsandina zimanê tirkî vekirin. Çelîk got; Nahêlin em bi zimanê xwe biaxîvin, emê jî ji bo wan protesto bikin, bi zimanê komara tirk biaxîvin.

Gelê Amedê li ser vê biryare got: Her bijî pêhlewanê neteweya kurd serok Feridûn! Bila çiyayê demawend û zalîmîn weke Dehaq egîdan bibînin ha!

- Şaredariya Batmanê navê kolanen bajarê xwe guhert. Serok Evdila Akin di civîna meclîsa şaredariyê de got: Her çiqas ber bi demokratîk bûnê ve gav nehatibe avêtîn jî emê navê hin mezinê Komara Tirk bidin kolanen bajarê xwe.

Kundirpress ev gotinê Akin li laboratûwarên Zanîngîha Oxfordê analîz kir û wateyek wisa derket holê: Bi zorê çûk li kevirê me ketîye. An emê serokatiyê bikin an jî emê dîsa dî yazîxana parêzgeriyê de betal betal li benda mişterîyan bin. Ji ber vê yekê jî emê nava xwe û komarê xweş, ji gelê xwe re xizmeta baş bikin.

- Yekitiya Niştimanperweren Kurdistan (YNK) ji ber ku li ser Mam Celal nûçeyan diweşîne rojnameya fülotonom Kundir protesto kir. Berdevkên YNK'ê serî li Pîneyê da û gotin; Kundir çîma bela xwe di Mam Celal de dide. Herkes dizane ku Mam Celal bejînzirav e û ne hûrfîlitî ye. Her wiha jîna Mam Celal li wî nadî, Mam Celal elokan naxwe, ji bo pereyên deriyê Xelîl Brahim bi PDK'ê re şer nake. Soz û qozêne wî yek in, diçê kîjan deverê gotinekê dike. Mam Celal bavê me ye. Niha li herêma me rewş zor çak e.

Kundir jî got: Bila dîrok nefetise, Mam Celal bijî!

'Birakuji' ya Faysal Dagli û 'Her Kûs Kendî Sûrusûle Üçar' a Mehmûd Baksî ji bo Soranî hatin wergerandin. Herdu pirtûk jî ji alîyê Daban Hamewendî ve hatin wergerandin û di nav weşanen Kurdistan Ewro de derketin.

KOMA ERMENİ YA ÇIYAYI XWEST KU LI ÇIYAYE AGIRIYÈ "HILKİŞNA JI BO DOSTANIYÈ"  
PÊK BÎNIN, JI BER HINCETA KU "NIYETA WAN FÊM NEBÜYE" DESTÛR NEHATE DAYIN.

HILKİŞNA  
JI BO DOSTANIYÈ  
Ü GAWA!  
Bi YA ME HUN QET  
DOST NAXUYIN  
...

